Erêna

- deqek bo gotûbêjê -

Sebrî Silêvanî

Em, wek regez bi aferîdeyên dengdêr û wek nasname jî bi kurd, dihên naskirin. Di herdu baran de, sermayeyê me tenê hindek pirsyarên hestdar in, bi awayê hebûn, jiyan û nasnameya me peywendîdar in. Belê, aya arastekirina pirsyaran peywendî li gel hebûn yan nebûna bersivan heyeş Pirsyar jî mîna rexneyê ne.

Mafê arastekirina pirsyaran û bikarhanîna rexneyê, mafek sade û rewa ye ji bo her mirovekê - takekes - belê, ji ber kêmiya ezmûnê û nebûna rahînanê, ne her takekes dizane yan dikare serederiyê li gel pirsyar û rexneyên xwe bike. Arastekirina pirsyaran û bikarhanîna rexneyê neku diyarde ne, belê enceq peyrrew in û bunyatgeriya xwe hene wek her têgeh yan pêkhateyek din yê ku azad û serbixwe di rehend û wateyê de.

Berî ku takekes pirsyarekê araste bike yan rexneyê bi kar bihîne; berî ku li pey rastiya hebûna tiştan bigere, gerek e li ser xwe rabiweste, amraz û alavên xwe ji bo berhemdanê û rewşenkariyê analîz bike lê, heya ku bikare bi wê kardariyê rabibe pêwîst e ku, wek destpêk, amraz û alavên xwe nas

bike ji ber ku peydakirina wan (***amraz û alav)*** dikare heta radeyekê astê hişmendiyê biselmîne.

Ezmûna rewşenhizrê kurd, bi giştî ezmûnek sînordar e û nevala ye ji kêmasiyan çunkî ezmûngeriyê herdem pêdivî bi prensîp û binemayên tevayî heye wek regez yan cor. Rewşenhizrên kurd - heya niha - penayê bo nav û formî tenê dibin, naçin di nav regez û coran de. Lewra jî, kar yan berhemê takekesane nagehe qûnaxa efrandin û dahênanê belê tenê di qûnaxa avakirinê de li nasname û rasteqîniya xwe digerin. Ji ber hindê jî em dikarin navê qûnaxê bikin "qûnaxa lixwegerînê".

Pirsyar û rexne dişên xweristeyek felsefeyane pêk bihînin. Belê bi merc ku takekesê rewşenhizr ji nav, form, cih û zemanan derbaz bibe heya ku di akam de bigehe kûrayiyên pirsyar û rexneyê û hîngê ji nû dê bizane ku pirsyar dikare bibe bersiv û rexne jî dikare bibe ziman.

kêmbûna alternatîv û çareseriyan ji kêmbûna ezmûn, mêtod û alavan e

Ji bo ku takekes bigehe felsefeyek taybet, pêwîst e ku bi hewl û hewldanên sêryoz berev akar, istatîka, epstmolojiya û mîtafîzikyayê here yan jî dê tûşî tivavek pirsyarên hilawîstî û xwegumanê bibe û di encam de dê ziyanê bigehîne sercem têgeh û pêkhateyan.

Takekes dikare bi rêya raveyê barê xwe sivik bike; ku jiyanê rave bike, cîhanê rave bike, hebûnê rave bike ji ber ku rave kêşe û pirsgirêkan çareser dike. Ravekirin piştî hewldanê ye û berî bîndariyê ye. Ew takekes hêj negehaye baweriyê ku kêmbûna alternatîv û çareseriyan ji kêmbûna ezmûn, mêtod û alavan e. Ev jî bi awayekê ji awayan bi hebûn û nebûna zimanan ve girêdayî ye çunkî peydakirina zimanên hevpeyvînê pirr kêm in û niha ji her demek din bêhtir pêwîstî pê heye. Herwesa avakirina pirên peywendiyê di navbera tex û aliyên cuda cuda de ew jî li gorî armancên her felsefe, raman û îdolojiyayê. Heman felsefe û raman û îdolojî jî pêdivî bi

sewda û hest du cemserên hevtevav in ji bo efrandin û dahênanê

dorhêlê praktîkane hene û ji bo ku xweristeyek praktîkane bidin, gerekê berawerdî û helsengandinek bo bûyerên serdemê takekesane hebin. Bi wateyek din: pêdivî ye ku takekes serdemê xwe nas bike ji ber ku di dorhêlê rojane de ew felsefe û raman û îdolojî bi xwe vegeryanek e bo ezmûna mirovayiyê û nimandin yan peresendiya hizra mirovan.

Rast e ku pêgirî û fermanberî dikare efrandin û dahênanê sinordar bike belê hindek caran, bi taybet ji aliyê sincî, pêgirî dibe mafek rewa bo takekesê ronakbîr

bo nimûne paraztina jiyanê: gerek e jiyanê biparêze û jiyan jî di têgeh û gewherê xwe de ji (seyroretê) pêk dihê û seyroret jî bi wateya guhorînê û guhorîn jî tek rastiya rasteqîne ye seranser dîroka civakê mirovayiyê, ango prosesek zindî û berdewame.

Belê, heta ku ew takekesê ronakbîr - berwext - bigehe wê baweriyê, gerek e ku hemû awayên hizrî yên selefiyane ret bike, mebest ne wek lêkolîn û serederî belê wek bingeh û jêder bo werar û aşnabûnê. Herweha, ku hêz û saziya zimanan wek alav û binemayên sereke di naverokê têkst, deq û peyamê de biselmîne ew jî bi rêya cudakirina ferhengan ji ber ku ne her ferheng dikare bibe alav ji bo peyamgeriyê û berhemdanê çunkî tenê prensîp û hewldanên mukum dikarin bibin alav.

Sewda dikare bibe serge ji bo wan karên nehêsan belê takekesê ronakbîr gerek e hişyar be û li ser hestên xwe yên xwezayane kolê nede. Ango, raman û sewdayê xwe bi kar bihîne ji bo ku bikare peywendiyan saz bike: peywendiyê li gel gewherê xwe, li gel bûyeran da ku biryara pejrandin û retkirinê di cihê xwe de be. Herwesa da ku delîveya pêdeçûnê wek alavek zêde berhev be.

Derbarê vê çendê rastiyek azarder heye ew jî ew e ku takekesê ronakbîr mewdayek berfereh di navbera sewda û hestên xwe de peyda dike, bi taybet katê ku pêrgî babet û pirsgirêkên xwe yên zindî dihê.

Bêhtiriya caran sewda û hest du cemserên hevtevav in ji bo efrandin û dahênanê bi taybet di wêje û hunerê de. Heta ku ew takekes vê bîrdoza berhev bo gêngeşeyê bipejrîne, baştir e ku herduyan bi kar bihîne bi merc ku hevsengiyekê di navbera wan de peyda bike da ku nakokiya xwezayane durist nebe.

Wek hercar ez dixwazim bi pirsyaran bi dawî bihînim:

Aya hest dikare sewdayî bedew bikeş

Yan, sewda dikare hestî rast bikeş

Yek emîn simînsra romana Kurdî hat lidarxistin

Li rojên 27-29î meha Gulanê şaxê Hewlêrê yê Yekêtiya Nivîskarên Kurd û li jêr durûşmê PÊŞXISTINA ROMANA KURDÎ NÎŞANA ŞARISTANÎKIRINA CIVAKA MEYE rabû bi sazkirina simînara yekê ya romana Kurdî. Roja êkê û piştî ku amadebûyî yek kêlîkê li ser canê şehîdên Kurdistanê rawestayn; peyvên wezareta rewşnbîrî û parêzgeha Hewlêrê hatine xwandin û paşan û wê rojê û rojên di pişt re jî karên hatîn amadekirin hatin giftûgokirin.